ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

YEKÇAV, DUÇAV, SÊÇAV

BEŞA DUYEMÎN

Di beşa yekemîn de, bi saya strana bisihir, bizin dibû mase û li ser maseyê jî gelek xwarinên xweş amade dibûn. Duçav bi saya wan xwarinan zikê xwe têr dikir û diçû malê. Lê belê piştî ku haya diya wê ji vî tiştî çêbû, îca diya wê ji ber hesûdiya xwe çû bizina malê kuşt û keça xwe ji wê kêfxweşiyê mehrûm kir. Em binêrin di vê beşê de, dê û xwişkên Duçav ka hê ew ê çi bînin serê Duçava belengaz.

Dema ku Duçav mirina bizina xwe dît, bi bazdan ji malê derket derve, li ser şînahiyan rûniştû dest bi giriyê kir.

Dîsa ew periya qenc bi carekê derket pêşiya wê û jê pirsî:

--Tu çima digirî, Duçav ?

--Ma ez ê çawa negirîm ?, got Duçav. Diya min serê bizina min jêkir. Bizina ku bi wê strana bisihir ji bo min dibû maseya xwarinê, ew êdî tuneye. Ez ê dîsa birçî bimînim, ew rojên xirab wê dîsa li min vegerin.

--Li şîreta min baş guhdarî bike, Duçav ! got periya delal. Tu ê ji xwişkên xwe roviyên bizina xwe bixwazî û tu ê wan li ber deriyê malê bixî bin erdê. Piştî wê, tu ê dîsa bextewar bibî.

Piştî wan gotinan, perî dîsa ji holê winda bû, Duçav jî vegeriya malê û ji xwişkên xwe re got: "Xwişkên delal, qet nebe ji bizina min tiştekî ji min re bihêlin. Ez tenê roviyên wê dixwazim, wekî din tu tişt naxwazim!" Li hemberî vê daxwazê, xwişkên Duçav bi hurehur keniyan û gotin: “Eger daxwaza te tenê ev be, ha bila ew ji te re bin !” Û Duçav roviyên bizinê girtin û êvarê bi dizîka li ber deriyê malê ew binax kirin.

Dora rojê serê sibê, Yekçav, Duçav, Sêçav û dayika wan, hemû ji xew rabûn, derketin ber derî û dîtin ku dareke muhteşem li ber derî şîn hatiye. Dar wisa xweşik, wisa delal bû ku devê hemûyan vekirî ma. Pelên darê ji zîv, fêkiyên wê jî ji zêr bûn!

Lê belê ev dar di şevekê de çawa hatibû wê derê?! Ji xeynî Duçav, ne dayik, ne jî du xwişkên dilreş sedema vê yekê dizanibûn. Tenê Duçav dizanibû, ji ber ku dar tam li cihê ku wê roviyên bizina xwe xistibûn bin axê, şîn hatibû.

Dayikê ji keça xwe ya mezin Yekçav re got: “Keça min, de ka hilkişe ser darê, ji wan fêkiyan çend heban ji me re bîne.”

Yekçav hilkişiya ser darê, lê belê dema wê destê xwe dirêj kir ji bo fêkiyekî zêrîn jêke, guliyê darê xwe bi carekê jê dûr xist. Keçikê li ser hev çend carên din jî ceriband lê her carê eynî tişt çêbû û wê nekarî fêkiyek tenê jî jêke.

Îca dayik ji Sêçav re got:

--Haydê keça min tu hilkişe, fêkiyekê ji me re bîne. Çawa be sê çavên te hene, tu ê karibî ji xwişka xwe ya Yekçav baştir vî karî bikî.

Yekçav ji darê daket, Sêçav hilkişiya darê, lê wê jî kir nekir, nekarî fêkiyek tenê jî jêke, her carê guliyên darê xwe ji destê wê jî dûr xistin û nehiştin ku destê keçikê li wan bikeve. Li ber vê rewşê dayikê xwe negirt û bi carekê hilkişiya ser darê, lê ew jî destvala ji darê daket.

--Ku ez hilkişiyama belkî min ê bikaribûya... got Duçava feqîr.

Xwişkên wê henekên xwe pê kirin û gotin:

--Çiii, tu ê bi du çavên xwe fêkiyan jêkî ?! Ha ha ha !

Duçav guh neda henekên wan û hilkişiya ser darê, lê vê carê guliyên darê xwe nedan alî, xwe ji destê Duçav dûr nexistin. Îca Duçav yeko yeko fêkiyên zêrîn berhev kirin û daket erdê. Dayik û herdu keçik jê pir hesidîn û li şûna ku jê re baş bin, tehde û henekên xwe zêdetir kirin !

Rojekê, dema her sê xwişk û dayika wan li ber dara muhteşem rûniştî bûn, begzadeyekî ciwan bi hespê xwe ji dûr ve xuya kir. Du xwişkên dilreş qîriyan gotin: “Zû xwe veşêre Duçav, ji bo ku em ji rûyê te di şermê de nemînin!” Herduyan wisa got û bi carekê Duçava feqîr tevî sêvên zêrîn ku wê hê nû ji darê jêkiribûn, xistin bin fiçiyekî vala û veşartin. Dema Begzade nêzî wan bû, dîtin ku yekî pir bedew û çeleng e. Îca Begzade hat li ber dara muhteşem a zîvîn û zêrîn sekinî û ji wan herdu xwişkan pirsî:

--Ev dar, a kê ye?... Kî bikaribe jê şitlekî bide min, ew çi ji min bixwaze ez ê pêk bînim.

Yekçav û Sêçav, herduyan bi hev re got ku ew dar, a wan e û wan xwe çeng kir ku ji darê şitlekî jêkin. Lê belê wan kir nekir, nekarî destê xwe nêzî şitilan bikin. Her carê şitilên darê dîsa xwe ji wan dûr xist. Begzade got:

--Bi rastî jî pir balkêş e ha ! Ev dar, a we ye û hûn nikarin şitlek tenê jî ji wê bigirin!

Herduyan xwe parast got ew dar bi rastî jî ya wan e, lê tam di wê kêliyê de Duçav ji derewa wan aciz bû û ji binê fiçî çend sêvên zêrîn gindirandin ber piyên Begzade. Dema Begzade sêvên zêrîn dîtin, ew ma heyirî û got "ev ji ku derê hatin wisa ?!" Îca Yekçav û Sêçav li xwe mikur hatin û gotin ku xwişkeke wan a din jî heye, lê ji ber ku wek mirovan du çavên wê hene, divê xwe nîşanî kesekî nede. Lê Begzade xwest keçikê bibîne. Û wî bi dengê bilind gazî wê kir, got:

--Duçav ! Derkeve, were vê derê !

Û Duçav ji binê fiçî derket, hat cem Begzade, sekinî. Ji ber delaliya keçikê devê begzade vekirî ma û got:

--Duçav, ez bawer im ku tu bikaribî ji darê şitlekî ji bo min jêkî!

Duçav got:

--Helbet ez dikarim, ji ber ku ev dar, a min e!

Û keçik hilkişiya ser darê, şitlek tevî pelên zîvîn û fêkiyên zêrîn ji bo Begzade jêkir û anî da wî.

"Îca ez ji bo te dikarim çi bikim, Duçav?" got Begzadeyê çeleng.

Duçav got "Aax, ax! Ez ku di nav xizanî, êş û elemê de dijîm û ji serê sibê heta êvarê birçî û tî dimînim, ku tu min bi xwe re bibî ez ê gelek kêfxweş bibim."

Begzade gotina keçikê nekir dido, hema ew bi carekê danî ser pişta hespê xwe û ew bir qesra bavê xwe. Li qesrê li gorî dilê Duçav odeyeke pir xweşik hat raxistin, cilûbergên delal ji bo wê hatin çêkirin. Û ji ber ku kêfa Begzade û Duçav jî pir ji hev re hatibû, wan daweteke muhteşem çêkir û zewicîn.

Piştî çûyîna Duçav a bi Begzadeyê ciwan re, herdu xwişk jê ecêb hesidîn û gotin: "Qet nebe ev dara muhteşem ji me re ma! Her çiqas em nikaribin fêkiyên wê berhev bikin jî, lê ew ê bala herkesî bikişîne vir û bi saya wê herkes wê gotinên xweş ji me re bibêje. Kî zane belkî şensê me jî wê rojekê vebe ha!"

Ew wisa fikirîn, lê belê rojek piştî çûyîna Duçav, herdu xwişk ji xew rabûn û dîtin ku dara ber derî ji holê rabûye. Bi vî rengî hêviyên wan berhewa bû. Lê li aliyê din jî Duçav li

ber paceya xwe disekinî û dît ku ew dar hatiye li ber deriyê wê bi cih bûye. Îca bi saya wê dara delal, Duçav her tim şad û bextewar bû.

Duçav bi salan di nav bextewariyê de jiyana xwe derbas kir. Rojekê, du jinên feqîr ji bo parsekiyê hatin li deriyê qesrê dan. Duçav çû ji nêz ve li wan nihêrt û dît ku ew, herdu xwişkên wê yên dilxirab in. Herdu xwişk wisa feqîr bûbûn ku ji bo pariyekî nan derî derî digeriyan. Îca Duçav ne bi dilekî, lê bi sed dilan ew pêşwazî kirin. Wê pêşî xwarin û vexwarin da wan, piştre jî odeyên taybet ji bo wan dan amadekirin. Ji ber vê qencî û dilxweşiya Duçav, herdu xwişk jî ketin şermê û pir poşman bûn ji ber wan xirabiyên xwe yên ku di ciwaniyê de anîbûn serê keçika feqîr.

Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya...